Welat
61
01/04/ 2019
Çandî - Giştî - Serbixwe

# ADAR KURTEDÎROKA KURDAN E



Tablo: Hunermend
Lukman Ahmad

Welat

# PEYVA WELAT

*Kovara* **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

*Sernivîser:*
**Aras Yûsiv**

*Desteya rêvebir:*
**Imran Yûsiv**

*Dizayner:*
**Hesen Berzencî**

**Têbînî**: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

*Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne*

**ji bo têkiliyê:**
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

## Adar kurtedîroka kurdan e

**Desteya sernivîs**

*Bê guman çi kesa-ê ku bixwaze kurtedîroka kurdan binase, dikare di nava rûpelên rojnameya meha Adarê de pêvajoya dîroka kurdî bi hemû xweşî û nexweşiyên wê bixwîne.*

*Belê lihevhatineke seyr e, çawa vê mehê dikarîbû di hembêza 31 rojên xwe de dîroka gelê kurd bicivanda !!? Hersal, kurd bi şewq û coş li hêviya Adara xwe dimînin, ji ber ku cejna kurdan ya netewî û pîroz di vê mehê de ye, lê di heman demê de jî destê wan li ser dilê wan e, ji tirsa ku bûyereke nexweş ji wan re veşartibe.*

*Bêdirû, Adar meha kurdan e, serê wê helkeftî koçbarkirina bavê netewa kurdî nemir Mustefa Barzanî ye, bîranîneke pir êşdar e, roja ku hemû gelê kurd li herçar parçeyên kurdistanê û li seranserî cîhanê têde giriyan.*

*Her wiha binê Adarê jî ango 31ê wê, helkeftî bîranîna bidarvekirina Serokê komara Mehabadê nemir Qazî Mihemed e, ew jî bîranîneke xemgîniyê ye.*

*Di navbera herdû bîranînên xemgîn de gellek bîranîn û helkeft derbas dibin, hin ji wan xweş û cihê şanaziyê ne û hin jî nexweş û cihê xemgîniyê ne.*

*11ê Adarê bîranîna rêkeftina sala 1970 ye ku di wê rojê de hukmê etonomî ji bo gelê kurd li başûrê kurdistanê hate ragihandin. Lê 16 ê wê bîranîna komkujiya Helebçe ye ku di sala 1980 de rûda û di encama bombarkirina bi çekên kîmawî ji alî rêjîma Beis a Iraqî ve 5000 ji kurdan-di nav wan de zarok, jin, pîr û kal- di rojekê de şehîd ketin .*

*18ê Adarê rojeke reş e di dîroka kurdî de, ku têde artêşa tirk û çeteyên sûrî yên bi ser wê ve Efrîn dagîrkirin. 20ê Adarê jî bîranîna komkujiya bajarê Hesekê ye ku di şeva Newrozê de û di encama êrîşeke hovane de ji alî rêxistina DAIŞ a terrorist ve bi dehan kesên sivîl ji zarok, jin û ciwanan şehîd ketin.*

*lê 21ê Adarê Newroz e, cejna kurdan ya netewî û sersala wan e......hwd.*

*Îsal jî em li hêviya meha xwe bûn. Dema ku Adar hat, me şev û rojên wê dihejmartin, destê me li ser dilê me bû, û me lava dikir da ku bi silametî derbas bibe.*


*Me nizanîbû ku 23ê wê dê bi serkeftineke mezin û dîrokî bê xemilandin, di vê rojê de rûxandina dewleta xilafeta Daîşê ya terrorist li ser destê şervanên kurd û hevalbendên wan hate ragihandin, ku ew weke serkeftineke dîrokî tête hejmartin.*

*Belê, Îsal Adara me merd bû, diyariyeke xweşik, giranbuha û pir bi nirx diyarî me kir. Tevî ku qelenê vê diyariyê pir buha bû, ew jî xwîna hezarên şehîdan ji keç û xortên kurd bû. Lê bi saya lehengî û mêrxasiya wan dengê kurdan li seranserî cîhanê belav bû û gelek dost û heval ji bo doza kurdî çêkirin.*

*Êdî vaye Adar pişta xwe bi me ve dike û diçe,, em bi hêvî ne ku di salên bê de rojin xweştir ji me re bîne, çiku Adar Adara me ye, em qedera wê ne, û ew qedera me ye.* ■

تبنّى ثورة
adopt a revolution

# TAYBETMENDIYÊN BIWÊJÊN KURDÎ



Salihê Heydo

Çawa tê zanînê, wêjeya kurdî ya devkî yan jî zargotin gelekî têr, dewlemend, tije û watedar e, her wisa ev jî tê wê wateyê ku gelê me ji kevntirîn gelên rojhilata navîn e, kontak û danûstandina wî bi her regezên jiyanê re –bi lawir, xurist û heyînên derdora wî re bi tevayî hebû, û di jiyana xwe de xwedî ezmûnek dûr û dirêj e.

Wêjeya devkî yan jî zargotina kurdî beşekî herî giring û balkêş e ji folklor, ji ber ku folklor bi xwe ji du beşên sereke pêktê (beşê şênbarî(Madî) û beşê razberî(Manewî) )

Beşê razberî, yê ku bi devan tê gotin bi navê wêjeya devkî yan gelerî û zargotin bi nav bûye. Wêjeya gelêrî bi xwe jî ji van beşên jêrîn pêktê;

Efsane, destane, çîrok, çîvanok, serpêhatî, qerf, stran, dîrok, mamik, biwêj û zûgotinok.

Ji ber ku mijar û gotina min li ser biwêja kurdî ye, ez dixwazim hinekî li ser bisekinim, wê şirovebikim û taybetmendiyên wê bînim kifşê.

Weke pênaseya Edyomê, bêguman pend, şar, biwêj û gotinên pêşiyan hemî bi navê Edyomê li gorî têgîna latînî hatiye bi nav kirin, û di zargotinê de beşekî herî giring, zengîn û watedar e. ji ber ew derbirrîna helwest û bûyerên rojane ye yên ku di jiyana netewe, civak û komelgehê de derbas bûne û derbas dibin, her wisa di naveroka xwe de zengeyekê (hikmetekê) vedişêre û ji nifşekî heya nifşekî tê gotin û jiberkirin. Bi vî awayî tê parastin.

Lê bi demên dûr û dirêj re hinhino tê jibîrkirin, ji ber ku tenê devokî dimîne.

**PARASTINA WÊ**

Ji boyî parastina Edyomê ji windabûn û jibîrkirinê, nivîsandin û belgekirin pêdivî ye, weke pirtûk, tomarkirina deng digel şirovekirinê bêyî ku bi naverok û forma wê bê lîstin, û ti destkarî jî têde nebe da ku ji wateya xwe ya sereke, dabeg û daxwaza xwe nekeve.

**CUDABÛN**

Edyom bi xwe jî weke zarave û xeberdanê ye, ew jî ji cihekî heya cihekî dîtir, ji herêmekê, hozekê, gundekî û heya yên dîtir guhertin li gorî devok û şêwezarê xwecehî di forma wê de çêdibe, lê dîsa di heman wate û naverokê de dimîne bêyî ku daxwaza xwe winda bike.

**TAYBETMENDÎ**

Edyomên kurdî bi van taybetmendiyên jêrîn têne naskirin û kifşê weke; Yek çuqlî, du çuqlî, sê çuqlî û çar çuqlî.

Mînaka yek çuqlî ; hevokek e yan dudo ne, lê bê rêzbend û kêşîn.

wek ;

-Aqilê sivik barê giran e.

-Rovî nediçû qulê, hejek bi teriya xwe ve kir.

-Rovî û sûk, hirç û govend.

Her wiha mînakên di heman wateyê de lê tenê guhertina form û devokan lê rûdide weke ;

-Av çiqas di golan de bimîne genî dibe.

-Ava Golan bi girrik e.

-Av di Golan de digemire.

Her wiha ;

-Kurmê darê ne ji darê be dar narize.

-Kurmê darê ne ji darê be fenabûna wê tineye.

-Kurmê dare, darê dirizîne.

-Kurmê darê ne ji darê be dar kurmî nabe.

Her wiha taybetmendiyên Edyomên kurdî bi gotinên famdar, hêsan, lihevhatî û şayik in, ji hevokeke kin û heya çaran pêktê û dawiya wan weke kêş û rêzbenda helbestê ye, bi taybet yên ji du hevokan û zêdetir weke ;

-Şebeşê batê, mala xwediyê xwe bir mîratê.

-Bera li goristanan be, û ne li şaristanan be.

-Heger bi hirî ba, wê li nav kerî ba.

-Dê bû dêmarî, bav bû marê qarî.

Hin mînakên sêhevok;

-Ji milkan aş, ji çekan qelemteraş, ji mêran ne yê bide pêş ne yê bide paş.

-Ne çiyayê bê rez, ne koçerê bê pez, ne ew kesê timî bêje ez.

-Mal bi milka ye, dew bi kilka ye, zêr bi çilka ye.

Hin mînakên çarhevok;

-Delav dûr e
Keç gulî hûr e
Qirik li ber şûr e
Hêvî bilûr e.

-Sê teres hene li dinê
Ê miya xwe bide bi bizinê
Ê genimê xwe bavêje şûna kizinê
Ê mala xwe bibe cem mala bavê jinê

Edyomên yekhevok

-Aş çûye, bi dû çeqeçeqê ketiye.

-Bextreş li emirkinan rast tên.

-Hesp dibeze, siwar pesnê xwe dide.

-Ga pîr dibe, gagurû pîr dibin.

-Meyra ruhn ji kêmdanî ye.

**GELEMPERIYA BIWÊJAN**

Bê guman, Edyom û biwêjên kurdî bi awayekî giştî û gelemper hatine ristin û vegotin, helewest û venerîn li her neqş û afirîdeyên xuristê û gerdûnê dane û şirovekirine weke ; gul, giya, erd, ezman, terwil, lawir, xişek, kimûrî, teyr, tilûr, dar û ber, heyv, rok, steyrik û mirov di her babetê de bi wate û dabaşak berfireh têne nimandin, û derûn û jiyana civakî weke; zulm û zor, xweşî û şadî, şênî û reşî bi ruhnî û rewanî tînin kifşê û raçavkirinê.

Hin nemûne yên afrîdeyên xuristê ;

-Xilt axê dikole û li serê xwe dike.

-Heger gur ji baranê bitirsiya wê ji xwe re kurkek çêkira.

-Dara xurt, guhnade bê.

-Çemê xurt ji çiyayê bilind tê xwar.

-Baran dibare, erd xwe dipesirîne.

-Ecelê gêrkê tê, baskê wê çêdibin.

-Hespa kihêl zenguyan nagihîne xwe.

-Heger beranê bisko ba, wê li ber deriyê babo ba.

-Ji kerê re gotin dehşekî te çêbû, go Êmê min sivik bû, bare min giran bû.

-Fira mirîşkê kadîn e, beza pisîkê kulîn e. ■

# GORA VALA



**Zekeriya Tamir**

*Werger ji Erebî ; Imran Yûsiv*

Cenêral mêrekî xwedî du pişik, aşikek, roviyên zirav û qalind, kezebek û damarên tijî xwîna sor bû, ti cudahî di nabera wî û mêrên din de tinebû ji bilî ku ew di artêşa welatekî de ku ne welatî wî ye cenêral bû.

Cenêral pir acizî ji karê xwe yê rotînî dikir, xewna wî ew bû ku rojekê li ziviyekî taybet bi xwedîkirina çêlek û sewalan be, an li nexweşxaneke taybet bi kesên seqet û pîr û kalan be kar bike.

Cenêral zirz bû, û pirîcaran bêmirûsk bû, ticaran ne digirnijî û ne jî şa dibû ji bilî dema ku tanî xeyala xwe bê çawa çûkek biçûk hewildide ku bifire û di hewldana xwe de têkdiçe, û çawa leşkerên wî yên sernerim dema ku gund û bajaran dagîr dikin, di wêrankirin û kuştina cîneşiyan de bi hev re dikevin hevrikiyê, û çawa jî ew çekên ku dikarin di çirkekê de sedhezaran qir bikin radestî leşkerên xwe dikir lê wan ew çek bi kar nedianîn da ku ji kuştina dijminên xwe ya hinohino û dilhênikbûna bi kuştina wan bêpar nemînin.

Rojekê hest bi şanaziyeke cuda kir dema ku çav li mûyekî reş ket ku li ser serê wî nû derdiket û şûna wan çend mûyên spî yên mabûn digirt, xwe bi wî mûyî pir paye kir û wekî nîşana mêraniyê û vegera ciwaniyê dît.

Zû bi zû mûyên laşê wî dirêj bûn heya ku çermê wî bi carekê re di bin riwekî gij û zivir de hate veşartin, hin bi hin rengê riwê wî hate guhertin.

Şevekê, xwest ku raze, lê nikarîbû, hest bi hêzeke biyan kir ku dikeve laşê wî, ji ser textê xewê çemkir, xwe li ber neynikê veziland û ziq lê nerî, dît ku ew bûye keftarekî mezin û pirçdirêj, neynûkên wî bûne penc, diranên wî bûne qîl.

Bi guhertina xwe kêfxweş bû, birçîbûnekê xwe da ser û nema dikarîbû xwe ragirta, beziya qirika hevjîna xwe ya razayî, û berî ku ji xewê şiya bibe ew kuşt , lê goştê wê yî pîr bi wî nexweş hat, lewre ew berda, û xwe avêt ser kurê xwe yî berşîr yê ku di xew de diginijî, goştê kurê wî yê teze pir bi wî xweş bû.

Pasevanekî çenêral li derveyî oda razanê rawestî bû, di rewşa amadebaşiyê de bû, tiliya wî li ser nikilê tivingê bû.

Ji nişkê ve keftarekî dev bi xwîn ji odeyê derket, pasevan zû agir berdayê û ew kuşt, hemû pasevan hatin û lê civiyan, bermahiyên laşê hevjînê û kurê wê dîtin, lê cenêral nedîtin, di baweriya wan de ku keftar cenêral tevde xwariye, û tiştek jê nemaye ku ji bo wî pêdivî bi gorekê hebe.

---

***Zekeriya Tamir***

*Wêjevanekî Sûrî ye, rojnamevan û nivîskerê kurteçîrokê ye.*

*Di sala 1931 de li Şamê ji dayik bûye, di sala 1944an de neçardibe ku dev ji xwendinê berde û wekî hesinkar di kargehekê de kar dike, dûre dest bi nivîsandina kurteçîrokê dike, pirtûkên wî yên çîrokî Ji bo gelek zimanan hatine wergerandin.*

**الأكتاف**

في مسيرته ظلّ يتكأ على الأكتاف, يستبدل القديم المنتهي صلاحيته بآخر جديد, وذلك توافقاً مع مكانة وأهمية المحطة التي وصلها, داوم على ذلك النَّهج حتى اتكأ على كتفٍ, اعتقد بأنه كتفٌ ليس بمقدور أحد ما تخطِّيه ولكن بما أنَّ طموحه أكبر, وبما أنَّه واثق من أنّ مسيرته لن تقف عند ذلك الكَّتف, فإنه جهد لإيجاد حلّ ما, ولكن وهو في غمرة التَّفكير لحلِّ تلك المعضلة تفاجأ بنفسه هاوياً على الأرض, جاهد للوقوف, ولكن كم كانت دهشته كبيرة حين عرف بأنَّه ما سقط إلّا لأن أحداً ما كان يتكأ على كتفه هو, وحين انتهت صلاحيته استبدل بغيره!!

- القصص من مجموعة "سرُّ البَقاء" الفائزة بالمركز الأول في مسابقة ديوان العرب *2016* الدورة السابعة للقصة القصيرة جداً.





# قصص قصيرة جداً

عامر فرسو



## حكاية الأسوار

حين لم تف الأسوار المبنية حول المملكة بالغرض المطلوب.. أمر الملك بإشادة سور حول المدينة ولكنه أيضاً لم يقلل من الخوف الذي ينتابه فأمر ببناء سور آخر حول القصر, ولكن هذا أيضاً لم يمنح الملك الهدوء والطمأنينة، فما كان منه إلا أن أمر ببناء سور حول عرشه ولأنه السور الأخير والخيبة الأخيرة فقد استبدل الملك بالسور أنشوطةً منحته السكينة الأبدية..

## قصة حب

قالها ونظرته تبحر في أمواج عينيها الحالمتين: حبيبتي دعينا نتبارى في العشق.. أكون المدى وأنتِ الأفق.. نندمج دون أن نلتقي ونبتعد دون أن نفترق.. فكان له من دون ما قصدٍ ما أراد من ألم الفراق, فقد تحققت نبوءة الدعوة ووافق قضاء الحب قدر كلمات العاشق فلم يندمجا في جسد ولم يفترقا في روح..

## خرائط

لم تنل حقّها في التعليم لذلك فقد كانت تعتقد بكل بساطة أنَّ خرائط الدُّول إما دوائر تشبه رغيف الخبز, أو مربعات كتلك التي طرزت بها المخدات في البيت, أو أنَّها مستطيلات طويلة كالحقول الخضراء المحيطة بدارهم, ولكن كم كانت دهشتها كبيرة, وهي تتابع قنوات التَّلفاز تعرض خريطة بلادها, فأبدت دهشتها وقالت: أهكذا كبقع الدم المراق مقسّمةٌ الأرض دولاً وأوطاناً بين البشر؟!

## حقيقة النّصر

كانت تعتلي أحد أبراج القلعة وهي تراقب الجيش الغازي المدجّج بالأبراج والمجانيق , الجيش الذي لم تصمد في طريقه أعتى الحصون والقلاع.. أمطرت طلائعهم بسحابة من الأسهم والنّبال ولكن رويداً.. رويداً صارت المجانيق تدكّ أبواب قلعتها فأرسلت كلمتها إلى قائدهم الجبار الذّائع الصّيت تحت راية رسول بيضاء.. تقدَّم الرّسول: يا سيدي تقرؤك الأميرةُ السَّلام وتقول: بإمكانه حتى أرذل البشر وأصلفهم أن يقطف الزَّهرة ولكن ليس بإمكان أعظم البشر وأقواهم أن يأخذ العطر عنوة سلّ القائدُ سيفه فتراجع الرَّسول مذعوراً.. غرز القائد سيفه في الأرض وخرّ على ركبتيه فقد استوعب أخيراً حقيقة النصر.

## لماذا؟

بكلّ رشاقةٍ ورهافة حسّ تُنقل أناملها المبدعة من نغمة إلى آخرة, تَغيب في مجهول الخيال لتغرقنا في الخيال المجهول .. كنا متسمّرين في مقاعدنا, وعلى رؤوسنا طيور ألحانها, وإبداعها حتى أننا لم نفطن لما جرى إلّا بعد أن ساد الصمت, رفعنا بوجل رأسها عن لوحة البيانو, كان الدم آخر نغمة في اللحن.. لم يسمع أحدٌ منا أزيز الرَّصاصة القاتلة، لكن الجميع سمعوا في صمت اللحن صيحته المدوية, وهو يتوارى في العتمة.. غسلنا العار؟!

## البطل

أول ما وطئت قدماه أرض المعركة تلقى طعنة في ظهره, لم يلتفت ليرى وجه الخائن, ولم يتقدم ليتقابل مع الأعداء وجهاً لوجه, بل ظلّ في مكانه على حدود الدَّهشة, ثار الغبار عالياً حينما تسابقت الأقدام في الفرار, وخفت الأصوات حين لم يعد هناك قدم بإمكانها الفرار, وطيور الموت حامت في السَّماء حينها التفت ورائه لا ليرى وجه الخيانة وأشباح الهاربين, بل ليتقدم نحو الأرض المهزومة, بعد مدة انقلبت الهزيمة في كتب التاريخ نصراً بينما الجرح ظلّ في الظَّهر..!!

# MÎR CELADET BEDIRXAN (1893-1951)



Endezyarê rêzmanê kurmancî, Ronakbîr û rewşenbîrê payebilind Mîr Celadet Bedirxan ji malbata Bedirxaniyan e, ku ew mîrên Cizîra Botanê bûn, malbateke bi nav û deng û kurdperwer e, di pêvajoya tekoşîna azadîxwazî û serxwebûna kurdistanê de xwedan xebateke berz û giranbuha ye.

Piştî serhildana BEDIRXAN beg (1842-1847) li hemberî zordestiya dewleta Osmanî, desthilatdariya Osmanî Bedirxanî ji Kurdistanê bi dûr xistin û ew li deverin Turkiyê yên cuda cuda belav kirin.

Bavê Celadet (Emîn Alî) kurê Bedirxan yê mezin bûye, ji ber kar û xebata wî ya netewî desthilatdariya Osmanî ew ji cihekî vediguhest cihekî.

Di nava rewşeke wiha de, Celadet di 26-6-1893an de li Stenbolê ji dayik dibe. Xwendina xwe ya seretayî û ya navendî li wir kuta dike.

Di temenê 18-19 saliya xwe de dikeve fakulteya leşkerî .

Celadet beşdarî cenga cîhanî ya yekem(1914-1918) dibe, û tevlî şerê Qefqasyayê jî dibe.

Di sala 1917an de digel birayê xwe Kamîran pirtûkekê bi navê (Rastiya Rûxandina Ederne) derdixîne.

Di navbera salên 1918 û 1919an de Celadet û birayê wî Kamîran û çend rewşenbîr û çalakvanên kurd digel siyasetmedarê Inglîzî (Mêcer Îdward Noêl) ji bo amadekariyên peymana Sîverê li nav hoz û elên kurdan digere, di vê gerê de Celadet gelek zargotinên kurdî mîna (pend-çîrok-serpêhatî-stran) dide hev, dema ku van zargotinan digel siyasetmedar û lêkolînerê Ingilîzî dixwîne, hizira danîna Elfebeya kurdî tê serê wî û dest bi danîna wê dike.

Dema ku Kemalî dest datînin ser desthilatdariya Turkiyê, siyaseteke tund li dijî kurdan dimeşînin, û fermana bidarvekirinê Emîn Alî û hersê kurên wî-Celadet, Kamîran û Sûreya- didin. Bav û birayê wî Sûreya diçin Mesrê, Celadet û birayê xwe Kamîran jî derdikevin Alemanyayê, li zanîngeha Myûnixê mafnasiyê dixwîne.

Bi çanda rojavayî û ya Alemanî bandor dibe, bi taybetî jî ramanên Basmark yên ku balê dikşînin ser rola ziman di parastina yekbûna gelê Alemanyayê de.

Li jêr bandora van ramanan Celadet guhdaneke taybet bi zimanê kurdî dike û dest bi danîna Bingeha Rêzimana Zimanê Kurdî dike.

Di heman demê de hiş û dilê wî bi ser welatê wî ve bûn, û pêwendîyên wî bi hundirê kurdistanê re qet qutnedibûn, bi hesteke neteweyî rewşa welat û hemû bûyerên ku

diqewimîn dişopandin.

Dema ku şoreşa Şêx Seîdê Pîran li dar dikeve, Celadet vedigere welêt, lê mixabin şoreş zû têkdiçe ji lew re cardin vedigere Alemanyayê .

Di sala 1926an de bavê wî nexweş dikeve, seba vê yekê diçe Mesrê û ji wir berê xwe dide Beyrûtê.

Piştî şikestina şoreşa Şêx Seîd, desthilatdariya kemalî siyaseta sojandina neteweyî (tirkkirinê) û qirkirinê bi tindutijiyeke hovane, bi devê tifingê û bi darê zorê li ser gelê kurd da meşandin, hemû tekoşer, ronakbîr û rewşenbîrên kurd dane ber dasa fermanên bi darvekirinê, di encamê de gelê kurd şeperze û tarûmar bû.

Li jêr gefa qirkirin û tinekirinê, pêdiviya kurdan bi rêxistiekê hebû da ku wan bide ser hev, birînên wan derman bike, hêviya azadiyê ji nû ve vejîne, tekoşînê bi rê ve bibe û rêya wê bidomîne, lewre hejmarek ji ronakbîr û tekoşerên kurd di nav wan de Celadet bû di 5-10-1927an de li Beyrûtê Komeleya Xoybûnê damezirandin.

di sala 1929an de wek parêzvan li Beyrûtê kar dike, di heman demê de jî dest bi nivîsandina bîranînên xwe dike.

Piştî têkçûyîna şoreşa Araratê û xebata çekdariya kurdî di wê demê de, Celadet digel hin ronakbîrên kurd li bajarê şamê dicive, di wê civînê de biryara xebata zanistî û rewşenbîrî didin.

Di çarçoveya vê xebatê de, di 15ê gulana 1932an de, hejmara yekê ji kovara Hawarê derdixîne, di Hawarê de Elfebeya kurdî û rêzimana Celadet tê weşandin.

Bi derxistina kovara Hawar, Celadet şoreşek di ragihandin û çapemeniya kurdî de afirand, kovar her 15 rojan carekê derdiket, lê bi naveroka xwe pir zengîn bû çiku kesên ku têde dinivîsîn bijardeya rewşenbîrên kurd bûn û xwedan pênûsine bilind bûn mîna (Nûredîn Zaza, Cegerxwîn, Qedrîcan, Osman Sebrî, Hesen Hişyar, Ehmedê Namî, Celadet Bedirxan, Kamîran Bedirxan û xeynî wan).

Celadet bi heşt ziman dizanîbû; (Kurdî, Tirkî, Erebî, Farisî, Almanî, Ferensî, Ingilîzî û Yûnanî). Di heman demê de pêwendiyên wî yên berfireh bi hin rojhilatnasan re mîna (Rojer Lîsko, Pîr Rindo û Tomas Biwa) hebûn, wan rojhilatnasan berhemnin pir bi nirx di der barê folklor, wêje û dîroka kurdî de nivîsîne û roleke wan a berz di kovara Hawarê de jî hebû.

Kovara Hawar li ser dirêjahiya 11 salan dihate derxistin, di nav re û ji ber sedemên cûbicûr ew carcaran dihate rawestîn.

Di sala 1932an, bi alîkarî û pişgiriya Celadet û li ser biryara Xoybûnê Civata arîkariyê ji bona belengazên kurd li Cizîrê li şarê Hisiça hate damezirandin.

Di sala 1937an de û bi alikariya Celadet Nadîya Ciwanên kurd li Amûdê hate damezirandin.

Di 1ê nîsana 1942an de Mîr Celadet kovara Ronahî jî derdixîne, ew jî kovareke mehane bû, û 28 hejmar jê derketin.

Bêdirû, li ezmanê rojnamegeriya kurdî, kovarên Hawar û Ronahî du stêrekên geş û ronak in, û ew qonax di dîroka rojnamegeriya kurdî de qonaxa herî zêrîn bûye.

Ji bo debara jiyana xwe, Celadet hin kar li Şamê kirine, wekî mamoste dersên zimanê Ferensî li dibistanê dane, û wekî parêzer û çavdêr li dezgeha Rêcê (ya Tûtinê) kar kiriye.

Ji bo başkirina rewşa xwe ya aborî, û bi alîkariya dewlemendekî kurd ku navê wî Hisên Îbiş bû, Celadet çandiniya pembo dike, lê mixabin di bîra qederê de wer dibe û jiyana xwe ji dest dide.

Bi vê bûyera xemgîn û bi êş, di 15ê tîrmeha1951ê de Mîrê zimanê kurdî Celadetê nemir koça dawî dike û li goristana Şêx Xalidê Neqşebendî li taxa kurdan li Şamê tê veşartin.

**Berhemên Celadet Bedirxan;**

-Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re.

-Ji mesela Kurdistanê.

-Gramêra Zimanê Kurdmanî (digel Rojê Lîsko)

-Ferhenga Kurdî Kurdî.

-Bîranînên min, ligel hin nivîsin din.

*Jêder ;*

*-Rewan ...Dilawerê Zengî*

*-Enternêt*

# EZÎZ XEMCIVÎN

„Helbestvan Balyozê Hestan e, nûnerîtiya Şaneke berpirsiyariyê ye“

**Hevpeyvîn:** Imran Yûsiv



*-Çîroka we û nivîsandinê kengî û çawa destpêkir ?*

**Xemla hemû Gotinan, Nexşeyeke ciwan berçav dike, Hetav jî Kunên tarî diyar dike, Helbest jî Toreya xwe li ber Pinpinîkên xweşî û nexweşiyê vedigire, Helbestvan jî ji bo nêçîrkirina Delîveya Evîndariyê amade ye..**

**Helbest wisa tête Şeqamên Aso, wisa Cil û Bergên Evînê li ber xwe dike...**

**Helbest bêdem hat, lê bêdem naçe, çimkî Pencereyên Dîrokê yên bêdadan diveke û herdem Serê xwe ji Çivîkan re liba dike...**

**Helbest hat, Pênûsê jî xêrhatina wê kir û me bi hev re ji sala 1980î Şahiya xwe kir... hêj em digel hevûdu dijîn, hêj em Gulistana xwe bi Kulîlkên rengîn dixemilînin...**

*-Helbest ji bo we çi wateyê dide ?*

**Helbest jî mîna Gogzemînê ye, Serdema Gogzemîn bi zindîdarên xwe avis (anko ducanî) bû, Dilê wê dibijiya Nakokî, Kêferat, Şahî, Pevçûn û Tevgerê... Demeke dirêj**

**Qolincên giran û dijwar buhûrandin, dawî ew Kîn, Ken, Hêrs, Şadî, Şerm, Şor, Şêrîn, Tirş û Tehl ji Malzaroa xwe ber bi Boşeyê ve hilfirandin û li ser Siriştê pekandin… Helbest jî nekêmî van Baran hildigire, Serê xwe dike her aloziyê û ji her Govendê nebêpişk e…**

**Helbest jî Peyamnêra Evînê ye, ji her derdî re bi Bersiv e.. Helbest Şana Hezkirinê ye, Hengên Evînê ji wê derdikevin û li wê vedigerin…**

-Helbestvan ji kê re helbestan dihûne ?

**Helbestvan Balyozê Hestan e, nûnerîtiya Şaneke berpirsiyariyê ye, Serdema xwe ji Cîhanê, Boşe û Xwezayê re diguhêze, Janên rojane di kuncên Bîrhatinan de vedişêre, Dengvedana Qîrîna Derdan e, Helbestvan hevalê Perwaneyan e, dinivîsîne tako Keviran bi ziman bike…**

*-Hin kes dibêjin; helbesta nûjen ji ya tirazûkirî (klasîk) hêsantir e, hin din jî dibêjin asoya derberînê di helbesta nûjen de firehtir e, hûn wek helbestvanekî ku helbesta nûjen dinivîse di der barê vê hemberkirinê de çi dibêjin ?*

**Ya giring libal min ne durv e, Naverok û Afirandina wêjeyî ye, kîjan Helbest hêsan e, ew ya kû Mirov nikare Navê Helbestê bide ser, lê Helbesta dirist bi Mercên helbestî, bi Wate, bi Hest û Hizir, ya Zindîdar ko dikare bandorê li hindirê Mirov bike, ew Helbest e…**

**Dema ez Melayê Cizîrî dixwînim ko berî 600 Salan nivîsandiye (Hub di Dil de Kîmya ye) wê hingê ez li Şêweyê ko Helbest pê hatiye nivîsandin naramim, çimkî Birûskeke Tîravêj li Hestên min dide!**

*„Min xwest ji hûnandina Jiyanê çend Keseran li ser Rûpelên Êşê birêjînim…*

*Min bi kûrahiya Hestên xwe li Jiyanê pirsî… êdî min sondên Hêsiran ji Pirsgirêkên Jiyanê cuda nekirin, nuha jî ez dixebitim û Kartêkirina wê Ronahiyê li ser Rûpelan ji we re dinivîsînim…*

*Ev Kurtejiyana Pênûsa min e…”*

*Ezîz Xemcivîn*

**Helbesta kurdî ya Nûjen jî xwedan bandor e, xwedan Xwendevan e, û bêtir ji 20-30 salan ve cihekî baş standiye, dibe jî piraniya Nifşên nû dinivîsînin û derbirîna Hestên xwe dikin bêyî ko li Rêzbendî û Tirazûyê bipirsin…**


**Bi dîtina min Paşeroj ji nûjeniyê re ye, Wêje bi giştî û Helbest jî beşek ji ewê nûjeniyê ye.**

*-Di helbestên we de, hestekî nazik, zimanekî zelal, wêneyên ciwan, herikdariyeke xweş û hûnandineke hevgirtî heye, Çawa we dikarîbû van hêmanan bi hev re bicivînin ?*

**Helbest Nameyek e, her Helbestvana/ê ko dinivîsîne awayekî ji bo gihandina Hestên xwe hildibijêre, dixwaze Nameya xwe bi awayê bijartî bo Xwendevanên xwe bigehîne , ta çi radeyê bi serdikeve an ne ew li Xwendevan vedigere, ne her yekî Pênûs rakir naxwe bûye Helbestvan û dibe ez bi xwe jî di nerîna gelekan de wisa bim, lê ya giring min hewildanek kiriye, min xwestiye ko karibim rajeya Helbest û Toreya kurdî bikim, û hêj di ewê hewildanê de berdewam im…**

*-Hûn rewşa helbesta kurda ya îronî çawa dinirxînin ?*

**Helbesta kurdî ji ya derdor û cîhanî nekêmtir e, di nerîna min de û herdem jî evê dîtinê dubare dikim. Her Miletek taybetiyên Toreya wî hene, taybetiya Zimên û Razeyên Civakî, her Civakek têra xwe Serbûrî, Derd, Êş, Keyf û Şahî hene. Afirênerî ne milkê**






**Cîhanê ye û Pişka me tê de nîn e, ne dirist e ev nerîn... Miletê me jî xwedan Serpêhatî, Folklor, Dastan û Dîrok e, lê aloziya Rewşa Miletê me, em ji belavkirina Toreyê li paş hiştine, Delîveya Nivîskarên me mîna yên Miletên din nîn e, ez ne wekû Behane evê dibêjim, lê ev rastiyek e...**



**Lê eger em binerin Zimanê tirkî û erebî ji hêla belavbûnê ve berî sed Salan ji Zimanê kurdî kambaxtir bûn, lê Tirk û Ereb bûn xwedan dewlet û serwerî xwedan Dibistan û Zanîngeh, Zimanên wan hat xwendin û nivîsandin, Ziman wisa bipêş dikeve. Dema Nifş Helbest, Roman û Çîrokê pê dixwînin û dinivîsînin.. h.d**

**Afrênerî jî bipêş ve diçe. Tirk û Ereban Zimanê xwe bi xwelîliserên wek me bipêşve birin... Eger Zimanê kurdî ji sed Salan ve heta nuha li Dibistanan bikar bihata, Mirov dê bi sedan an bi hezaran Yaşar Kemal, Selîm Berekat ,Ehmed Arif û Ehmed Şewqî bi Kurdî bixwendana.**

-Di pêvajoya ezmûna we de di cîhana helbestê de, çi astengî we dîtin, di der barê bîranînên we yên helbestî de hûn çi dikarin ji me re bibêjin ?

**Çi Kar û Xebata wêjeyî bê Alozî nîn e, Mirovê Nivîskar gelek dijwariyan dibîne, bi taybetî li civaka me, lê min ji aliyê malbatê ve tiştekî wisa nedît, eger Dê û Babê min piştgiriya min nedikirin jî lê dijî min jî dernediketin, nepiştgiriya wan jî çimkî li ser min ditirsiyan (ji hêla hêzên Ewlehiyê). Min ji destpêka Jiyana xwe ve li Stranên Folklorî, Netewî û Evînî guhdarî dikir, min Tîpên xwe li ser Bingeheke hêzdar ava kirin...**

*-Ji bilî helbestê, ti hewldanên we yên nivîsê, an jî nivîsên we hene ?*

**Min Çavên xwe li ser nivîsandina Helbestê vekiriye û hêj berdewam im, lê ne tenê di warê Helbestê de belê min Bexşan, Gotarên rexneyî, Serbûrî û du Roman jî nivîsandine, lê Helbest ew Evîna min e û ji bil Helbestvaniyê li çi Warên din yên Wêjeyê xwe nabînim...**

***10-Berhemên heya niha çi hene, kîjan dîwan li ber dilê we şêrîntir e ?***

**Berhema min a yekem Sala 1990î min Alfabêyeke kurdî çap kir, di pey re dîwana min (Zindana Piçûk) û (Pejal), Pertûka Jiyana mele Ehmedê Palo (werger ji zimanê erebî), Gotinên Pêşiyan û Idyomên kurdî û min Helbesteke Esma Seqir Elqasimî wergerandiye zimanê kurdî ew jî çapkirî ye...**

**Berhemên neçapkirî bêtir ji deh Pertûkan hene, mixabin hêj derfeta ronahiyê nedîtine.**

*-Pirojeyên we ji bo siberojê çi hene ?*

**Bi hêvî me Pertûkên xwe çapkirî bibînim...**

***-Gotina we ya dawî....?***

**Ji Kurdan daxwaz dikim, Kurdîniyê û Zimanê kurdî di Hişê zarokên xwe de biçînin...**



**FERHENGOK**

| | |
|---|---|
| ferewanî | وفرة |
| hûraêj | رشاش |
| firqas | هروب -ابتعاد |
| fişar | ضغط |
| Fort-gef | تهديد |
| gangaz | سهل-ممكن |
| Caris-garîs | شرير |
| gaztîn | ساحة |
| gulaşî | مصارعة |
| Pirçêr-çenebaz-lewçe | ثرثار |
| gelwaz | طوق |
| gendel | فاسد |
| gêzik | مكنسة |
| gemşo | مصارع |
| gewez | لون ناري |
| fayton | العربة التي يجرها الحصان |
| ferş | الحجر المسطح |
| firtone | طوفان |
| firîsk | من ورود الربيع |
| gulyaz | كرز |



# ZIYANÊN BARANA ÎSAL

Efsan Kurdî

Wek ku tê zanîn, bajarê Amûdê ji kevntirîn bajarên rojavayê Kurdistanê ye, lê tevî wiha jî, ev bajar ji aliyê avahiyê ve pir li paş maye û jêrxaniya wî ya bingehîn pir lawaz e.

Ji ber ku piraniya cîneşiyên Amûdê kurd in, ev bajar û hemû deverên kurdî ji alî hikûmetên desthilatdar yên Sûryê ve hatibûn feremoşkirin û piştkuhkirin, û bi siyaseteke şofînî û berdoz ew ji xizmetguzarî û pêşxistina avahî bêpar hiştin.

Li Amûdê, mîna li hemû bajarên kurdî, piraniya xanî û avahiyan ji ax û heriyê ne, lewre her sal bi rengekî asayî û gelemperî pêdiviya wan bi çaksaziyê heye çiku baran zivistanê ziyanê digihîne wan.

Barana ku îsal bariya ne wekî hemû baranên berê bûye, lewre ziyaneke pir mezin gihand xanî û avahiyên welatiyan yên ji ax û heriyê û hin ji wan jî hatin herifandin.her wiha jiyana gellek cîneşiyên deverê xisteye metirsiyê.

Di der barê vê mijarê de hin welatiyên deverê ji kovara Welat re axivîn .

Welatiya bi navê Terfa Ehmed ku ew ji bajarê Amûdê ye û xaniyê wê jî ji axê ye bi vê pirsê dest bi axaftina xwe kir;

Gelo qey wê çile bighêje çilê ku tê !?

Ma gelo îsal havîn nayê !?

Terfa kesereke kûr kişand, axaftina xwe domand û got ;

"Eve 20 sal in ku ez û kufletê xwe di xaniyekî ax û heriyê de dijîn, ew bi xwe kavilekî xerabe ye, her sal em ser pişta wî diseyînin ta ku em demsala ziviztanê têde biqedînin bê ku dilop bi ser me de bibarin. Ev xaniyê ku em niha têde ne gelekî kevn e, temenê wî nekêmî 40 salî ye, sal bi sal pê dihat qedandin, lê îsal em gelekî jê bi tirs in ku bi ser me de bê xwarê.

Îsal ne wek hemû salên berê ye, xanîyê me gelek dilopan dike tevî ku me wek her sal liser pişta wî seyandibû.

Dîwarên wî jî bi telaşan ji derve de dihelwişin, wek barana îsal me nedîtiye.

Em dixwazin vî xanî xerab bikin û ji nû ve xanîkî bi çemento ava bikin , lê mixabin imkanên me tinene ji ber avahiya bi çemento pir buha ye. tenê em dikarin lava bikin ku xwedê me û yên wek me biparêze."


Di der barê ziyanên ku barana îsal gihandiye avahiyên ji axê de hostayekî avakirina xaniyên kelpîç û heriyê ku navê wî Kemal Xelîl e ji kovara Welat re axivî û got ;

"Berdewmiya barîna baranê û rêjeya wê ya pir zêde, ziyaneke mezin gihandiye xaniyên axê, bi giştî avahiya wan sist bûye û ew toşî herifandinê ne, ji ber ku rok bi carekê re deneket da ku zuha bibin.

Wek ku tê zanîn, xaniyên ji herî û axê demkî ne, ya baş ewe ku li şûna wan xaniyên ji çemento bêne avakirin.

Dibe ku karîn û imkanên xelkê tinene ku xaniyên xwe yên ax xerab bikin û li şûnê xaniyên çemento ava bikin, lê îroj derfetek ji wan re hatiye ku bidin destê kompanîyên avahiyê û (Mute'hidan) yên ku beramberî avahiya xaniyan 35% didin xwediyê erd."

Hêjayî gotinê ye ku di van salên dawî de tevgereke avahiyê pir çalak li deverên kurdî peyda bûye, kes û kampaniyên taybet bi avakirinê avahiyên çarkat ava dikin beramberî wê du xaniyan (Şiqe) ku tenê bi stun û banî ne didin xwediyê erd û yên mayî ji xwe re difroşin, lê pircaran karê van kes û kampaniyan ne durist e, û ne li gorî merc û şertên avahiyê ye wek ku tê xwestin, ev yek jî dihêle ku baweriya gelek welatiyan bi karê van kesan neyê.





# ظاهرة الطلاق بين اللاجئين السوريين في تصاعد مستمر

تقرير مجلة ولات

**بعد** نشوب الحرب الداخلية في سوريا والتي بدأت بمظاهرات سلمية طالبت بالإصلاحات في البلد وتطورت إلى حرب مدمرة استخدمت فيها كل أساليب القتل و الترويع و الإرهاب بما فيها القتل على الهوية والتي لازالت مستمرة إلى يومنا هذا. مما تسبب في مقتل الآلاف من السوريين و دمار كبير في الاقتصاد و البنية التحتية و عمليات واسعة من التهجير القسري رافقتها عمليات خطف و تغييب قسري و في ظل انعدام شبه كامل للأمن و الاستقرار نزح ملايين السوريين من مناطقهم و هاجرت ملايين أخرى إلى دول أوربا و أمريكا و استرالية هربا من آلة القتل و بحثا عن الأمان و الحياة الكريمة.

هناك واجه السوريون معاناة من نوع آخر فالعادات و التقاليد و أنماط الحياة في دول اللجوء مختلفة تماما و تكاد أن تكون متناقضة كليا مع معتقدات السوريين و قيمهم الاجتماعية لذلك فهم يواجهون صعوبات بالغة في عملية الاندماج مع مجتمعاتهم الجديدة .

الكثير من اللاجئين السوريون أصيبوا بالاكتئاب بعد الوصول إلي تلك البلدان و بدأت بعد الظواهر تطفو على السطح و منها ظاهرة الطلاق التي باتت تنتشر بسرعة و بشكل واسع بين السوريين. وقد تسببت بنشوب حوادث مؤسفة بما فيها القتل في حين مازالت هذه الظاهرة في صعود مستمر ولأسباب مختلفة فهناك من يعزو هذه الظاهرة الى أن المرأة في بلد المنشأ (سوريا) لم تكن تمتلك القدر الكافي من القوة و الجرأة نتيجة خضوعها الصارم للقيم و الأعراف الاجتماعية إضافة إلى عدم وجود قوانين تحميها ، و افتقادها للتحرر الاقتصادي، كل ذلك كان يحول دون مبادرة المرأة بطلب الطلاق مهما كانت الظروف التي تعيشها و تعاني منها ، لكن في أوروبا اختلف الأمر تماما حيث تتوفر لها الحماية القانونية و التحرر الاقتصادي في ظل مجتمع جديد و مختلف تماما، كل ذلك منح المرأة القوة و الجرأة لتكون هي المبادرة في الانفصال عن زوجها .

و يرى آخرون بأن المشاكل الزوجية كانت موجودة من قبل بين الزوجين و لكن اعتبارات كثيرة كانت تمنعهم من الانفصال عندما كانوا يعيشون ضمن مجتمعاتهم الأصلية و لكن عندما وصلوا إلى أوربا لم تعد تلك الاعتبارات موجودة و هذا ما ساعد على انتشار ظاهرة الطلاق .

حول هذا الموضوع التقت مجلة ولات بالسيدة (هـ_م) (وهي إحدى المطلقات حيث قالت :

« لقد تزوجت قبل نشوب هذه الثورة ببضعة أشهر وكان زواجنا عن حب سابق دام بيننا سنين قبل أن يتقدم بخطبتي من أهلي, بعد الزواج لم تحصل بيننا أية مشاكل



تذكر وكنا سعداء بحياتنا.

بعد نشوب الحرب أضطر زوجي للسفر إلى كوردستان العراق هربا من الالتحاق بالجيش و بعد مرور ٦ أشهر التحقت بزوجي وبقينا هناك لمدة سنة وبعدها قرر زوجي الهجرة إلى دولة أوربية ولكنه لم يتمكن وقتها من أن يصطحبني انا وطفلته الصغيرة معه بسبب عدم وجود المال الكافي لتحمل تكاليف الطريق, لكنه وعدني بأنه حال وصوله سيعمل على أوراق لم الشمل كي نلتحق به.

تمكن زوجي من الوصول إلى ألمانيا وكان على اتصال دائم معي و كان يقول لي بأنه يشتغل بأوراق لم الشمل و أنا كنت انتظر بفارغ الصبر ذاك اليوم الذي اجتمع فيه بزوجي و يلتم شملنا من جديد , حينها كنت قد عدت إلى سوريا وكنت أعيش في بيت أهلي انتظر الانتهاء من أوراق لم الشمل.

بعد مرور سنة ونصف انقطعت أخبار زوجي و لم يعد يتصل بي فشعرت بالقلق خشية أن يكون مريضا أو قد أصابه مكروه ما, ولم يمر أسبوع على انقطاع اتصاله ليفاجئني بإرسال شخص إلى بيت أهلي و يخبرهم بأنه طلقني بدون أي سبب يذكر وإلى يومنا هذا لا اعرف سبب الطلاق ولم يتصل بي كي يخبرني عن السبب الذي دفعه لفعل ذلك لكن بعد فترة من السؤال عنه من أقربائه علمت بأنه قد تزوج بامرأة ألمانية تكبره ب ١٠ سنوات طمعا بمالها , لقد باعني وباع طفلته مقابل القليل من المال».

الشاب (م_ا) الذي رفض ذكرا اسمه و هو أيضا أحد اللاجئين من ضحايا الطلاق وأثناء زيارته إلى عامودا تحدث لمجلتنا قائلا :

«بسبب الحرب وغلاء المعيشة سافرت إلى إحدى الدول الأوربية, وبعد معاناة من العمل بأوراق لم الشمل تمكنت من إحضار زوجتي وأولادي الثلاثة لنعيش معا و كانت سعادتنا كبيرة , لكن لم يمضي على لم شملنا إلا ٨ أشهر فقط حتى طالبت زوجتي بالطلاق محتمية بقوانين تلك البلاد.

أما عن السبب فكان خلافات عائلية روتينية و بسيطة كانت تحدث بيننا عندما كنا في الوطن أيضا ولكنها ما كانت لتتطور إلى ما يستحق الانفصال, لكن زوجتي استغلت قوانين تلك الدولة لتطلب الطلاق دون أن تترك لي فرصة لمناقشة الأمر, لقد كان طلبها مفاجئا لي , حاولت أن أناقشها في الأمر و حل الخلاف بهدوء لكنها رفضت و أرادت العيش لوحدها, لم يكن أمامي حل سوى الرضوخ لطلبها.

ما يؤلمني و يشغل تفكيري هم أطفالي الثلاثة الذين أصبحوا ضحية لمزاجية أمهم, أما هي فلم تعد تهمني على الاطلاق لأنها هي من طلبت الطلاق و اتخذت هذا القرار دون إحساس بالمسؤولية.

ظاهرة الطلاق أصبحت تنتشر بين السوريين في دول اللجوء بشكل كبير جدا ناهيك عن تركهم للعادات والتقاليد التي تربوا عليها.»

| ماذا يقول الطفل أو المراهق | كيف يجب أن نفسر كلامهم |
|---|---|
| "أنا لا أهتم» ،»ليس لدي ما أفعله»،»لا أريد شيئًا" | فقدان الاهتمام والسرور |
| "أنا فاشل" | فقدان احترام الذات وانخفاض في تقديره |
| "لا أستطيع" | العجز |
| "هذا خطأي»، «أنا سيئ»، «أنا أشعر بالخجل" | الشعور بالذنب، العار |
| "والداي لا يحباني" | فقدان الحب والشعور باليأس |
| "لا أحد يحبني" | في بعض الأحيان التفكير في الموت والانتحار |
| "لا أستطيع أن أفعل ذلك، هذا صعب للغاية»، «أنا لا أفهم أي شيء»، «أنا لا أعرف، لا أتذكر هذا" | اضطرابات في الانتباه والتركيز والذاكرة |

هـذه التغيـرات السـلوكية مـن الصعوبـات التـي يواجهونهـا في المدرسـة والتـي يجـب ان تجـذب انتبـاه المعلمـين و الأهـل.

غالبـاً مـا يتفاعـل الطفـل الـذي يعـاني مـن مشـاكل التركيـز عـن طريـق تجنـب أو رفـض العمـل الموكل لـه مثـل الدراسـة، أو إذا اسـتمر في العمـل لسـاعات طويلـة دون نتيجـة. في كلتـا الحالتـين، النتيجـة هـي الفشـل في المدرسـة.

مـن سـلوك المعارضـة إلى الاسـتنكار الـذاتي، الـذي يعـززه أحيانًـا رد فعـل الأسرة، يخلـق حلقـة مفرغـة يـزداد فيهـا الاكتئـاب سـوءًا، دون أن يتـم الاعـتراف بهـا أو حتـى الاشـتباه في حدوثهـا.

**اكتئاب الأطفال والمراهقين: عوامل الخطر**

ترتبـط اضطرابـات القلـق بالاكتئـاب في ٤٠ إلى ٧٠٪ مـن الحـالات. هـذا يمكـن أن يكـون قلـق الانفصـال، اضطـراب الهلـع، رهـاب المدرسـة وصعوبـات التعلـم عنـد الأطفـال.

غالبـا مـا تحـدث السـلوكيات التخريبيـة (أو الاضطرابـات السـلوكية) قبـل الاكتئـاب، والتـي تشـكل عامـل خطـر. والتـي يمكـن أن تسـتمر معهـم لمـدة طويلـة.

مـن السـلوكيات المحفوفـة بالمخاطـر تكـون بالأخـص عنـد اسـتخدام الكحـول أو المخـدرات ذات التأثـير النفسـاني وتـؤدي في كثـير مـن الأحيـان إلى اضطرابـات ثانويـة للاكتئـاب لـدى المراهـق.

**الاستشـارة، العـلاج ...كيفيـة التعامـل مـع الاكتئـاب لـدى الطفـل أو المراهـق؟**

في مواجهـة تغيـير في سـلوك الطفـل أو المراهـق الـذي لا يـشرح بشـكل صحيـح مـن قبـل الأسرة أو الوسـط الاجتماعـي، وإذا اسـتمر هـذا التغيير بشـكل مطـرد مـع وجـود معانـاة فيجـب عـلى العائلـة استشـارة أخصـائي الصحـة أو طبيـب الأسرة.

دور الطبيـب أو طبيـب الأطفـال مهـم سـواء مـن الناحيـة التشـخيصية أو العلاجيـة. قـد يكـون التشـخيص والتوضيـح للعائلـة والحصـول عـلى المسـاعدة كافيـاً للتغلـب عـلى الحلقـة الاكتئابيـة.

ولكـن إذا اسـتمر هـذا الاضطـراب، فمـن المستحسـن أن نـرى طبيـب نفسـاني يمكنـه أن يقـرر أفضـل رعايـة ممكنـة للطفـل.

عنـد الأطفـال والمراهقـين، نـادرا مـا يشـار إلى العقاقـير المضـادة للاكتئـاب. ولكـن، يمكـن اسـتخدام عـدة أشـكال مـن العـلاج النفـسي؛ يتـم اختيـار الأنسـب بالتشـاور مـع الأسرة والطفـل نفسـه.

**أطفال الشخص مصاب بالاكتئاب**

يعـاني أطفـال لوالديـن الذيـن يعانـون مـن الاكتئـاب مـن مشـاكل نفسـية أكـثر مـن غيرهـم. الخطـر هـو أعـلى ثـلاث مـرات بالنسـبة لهـم، فيـما يتعلـق باضطرابـات المـزاج.

أظهـرت دراسـة اسـتقصائية أن ٢٤٪ مـن الأطفـال في عمـر سـنة واحـدة المولوديـن لأمهـات مكتئبـات يظهـر عليهـم اضطرابـات في التفاعـل. وفي الآونـة الأخـيرة، تبـين أن ٤٠٪ مـن الأطفـال لآبـاء يعانـون مـن مشـاكل عاطفيـة أثنـاء الـولادة يتلقـون رعايـة نفسـية عـلى مـدة الحيـاة.

تأثـير العلاقـات بـين الوالديـن والطفـل هـول أمـر بالـغ الأهميـة لتطـور اضطرابـات الاكتئـاب عنـد الأطفـال، مـن مرحلـة الطفولـة إلى المراهقـة. حيـث يتميـز وقـت المراهقـة بتحـولات مهمـة جسـدية وبيولوجيـة ونفسـية.

أيضـاً، إذا كان الأطفـال أو المراهقـين يعيشـون مـع شـخص مكتئـب، فيجـب أن نـشرح لهـم أن الشـخص المكتئـب غـير مسـئول عـن حالتهـم وأنهـم بحاجـة إلى رعايـة ودعـم.

**تطور الاكتئاب: و ما هو مستقبل الطفل المكتئب؟**

الخطـر الرئيـسي مـن تطـور اضطرابـات اكتئابيـة في سـن الطفولـة هـو عـلى وجـه الخصـوص تكـرار نوبـات مماثلـة خـلال فـترة المراهقـة.

يمكـن لخطـر الانتـكاس والاكتئـاب في سـن المراهقـة أن يصـل بالفعـل إلى ٧٠٪ بعـد ٥ سـنوات (للاكتئـاب الشـديد). وعـلى النقيـض، فـإن اضطـراب رد الفعـل الاكتئـابي لا يعقبـه تقريبًـا أي نوبـة اكتئابيـة كبـيرة.

<u>أما في مرحلة البلوغ، فمن المستحيل حاليًا اتخاذ قرار:</u>

تظهـر بعـض الدراسـات أن العديـد مـن الأطفـال الذيـن يطلـق عليهـم «المعرضـون للخطـر» قـد يتمتعـون، رغـم كل الصعـاب، بمهـارات أفضـل مـن البالغـين الذيـن يعتـبرون آمنـين؛

تشـير دراسـات أخـرى إلى أن الأطفـال المصابـين بالاكتئـاب، لـن يكـون لديهـم حـالات الاكتئابيـة في مرحلـة البلـوغ.

مـن ناحيـة أخـرى، فـإن المراهقـين المصابـين بالاكتئـاب سـيكونون أكـثر عرضـة للاضطرابـات الاكتئابيـة في سـن البلـوغ

في الختـام، نحـن نسـتطيع القـول أن مرحلتـي الطفولـة و المراهقـة مـن مراحل الحساسـة التـي تأثـر عـلى حيـاة و مسـتقبل الشـخص. ومـن اجـل ضـمان حيـاة صحيـة وهادئـة لأبنائنـا يتحتـم علينـا الإصغـاء لهـم وتكويـن علاقـة صداقـة معهـم لمعرفـة آلامهـم و الحيلولـة دون تعرضهـم لمخاطـر الاكتئـاب الـذي أصبـح مـرض العـصر.

# التعرف على الاكتئاب لدى الأطفال والمراهقين

هيلا محمد

الاضطرابات السلوكية، المخاطر التنموية، أزمة المراهقين قبل سن العشرين، تغير مزاج الطفل. كيف نكتشف أن الأمر له علاقة بالاكتئاب؟

كيف يجب تفسير ما يقولونه مثل «أنا لا أهتم»، «أنا سيئة»، «لا أحد يحبني".

الطفولة والمراهقة هي فترات حياة مرادفة للفرح واللامبالاة. ولكن بعض الأطفال والمراهقين يمكن أن يواجهوا حالات من التوعك الحقيقي. نعم، والاكتئاب هو المرض الذي يمكن أن يؤثر أيضا على الشباب.

**الاكتئاب يؤثر أيضا على الأطفال والمراهقين**

في فرنسا مثلاً، في عام ٢٠١٠، بينت دراسة أنه بين ٢,١ و٣,٤ ٪ من الأطفال و١٤ ٪ من المراهقين تأثروا بالاضطرابات الاكتئابية ، هذا يمثل شريحة واسعة، سواء من حيث المعاناة الفردية أو الصحة العامة. ونتيجة لهذه الإحصائية المثيرة للقلق، فإنه يتوضح لنا أن محاولة الانتحار هي واحدة من مضاعفات الاكتئاب.

على عكس ما نراه في البالغين، فإن معدل ظهور الاكتئاب هو نفسه بالنسبة للفتيات والفتيان في مرحلة الطفولة. ولكن في سن البلوغ، نلاحظ ازدياد ملحوظ لحالات الاكتئاب بنسبة ٢ إلى ١ بالنسبة للإناث. التفسيرات المطروحة لسبب ارتفاع هذه النسبة لدى الإناث تكون بالأساس مرتبطة بالحالة النفسية والاجتماعية: حيث الفتيات المراهقات لديهن نسبة اقل لاحترام الذات مع النظرة السلبية لأجسادهن بالمقارنة مع الفتيان.

**أعراض الاكتئاب لدى الأطفال والمراهقين**

لفترة طويلة ظل الاكتئاب مشخصاً بشكل سيئ عند الأطفال والمراهقين. لكن اليوم، من المؤكد أن «النواة الصلبة» للأعراض الاكتئابية هي نفسها سواء كان طفلاً أو شخصًا بالغًا:

- الحزن
- عدم الاهتمام
- تثبيط فكري
- الأفكار السلبية
- اضطرابات النوم (رفض النوم، صعوبة في النوم، النوم بشكل سيئ، التعب )
- اضطراب الشهية (عند الأطفال هو نقص الشهية التي تسود، أما عند المراهق، تكون في كثير من الأحيان الرغبة الشديدة في الأكل).

ومع ذلك، قد تكون بعض الأعراض الاكتئابية محددة لهذه الفئات العمرية.

**عند الطفل**

يمكن أيضا أن يتجلى الاكتئاب من خلال:

- سلوك الانسحاب، أو الغياب، أو - على النقيض من ذلك - يصبح عصبي، متحمس، يستنفد نفسه في نشاط عقيم، يغضب. في أوقات أخرى، ينطوي على نفسه.
- الشكاوى المتكررة حول الجسم: الألم المتكرر على سبيل المثال.

**عند المراهق**

في هذه الفئة العمرية، يتم التعبير عن الاكتئاب أكثر بالسلوكيات:

- التهيج
- الإثارة
- العدوانية
- الإساءة اللفظية
- اللامبالاة الظاهرة
- الهروب المدرسي
- السلوك الضار بصحتهم: تعاطي الكحول والمخدرات والأدوية (المزيلة للقلق، المنومات)

**ملاحظة:** غالباً ما يكون التفكير في الانتحار من أعراض الاكتئاب لدى المراهقين.

**كيف يجب على الأهل فهم كلام الطفل والمراهق المكتئب**

يحتاج الأهل الاستماع بآذان صاغية أوفهم معاني الكلمات والعبارات التي يقولها الطفل أو المراهق والتي قد تعبر عن الحزن المرضي وأعراض الاكتئاب.



# TU LI RÊZA HERÎ JOR Î

Qasimê Xelîlî

*Dilber tu ya payebilind*
*Yê nizm ez im di bin ferman*
*Şewutîme ez mîna find*
*Eşqa te agir ez dûman*

*Zeman zeman ez li ezman*
*Li erdan im ez hin deman*
*Dixiriqim ez di çav de*
*Dibim ez şiv wek ya keman*

*Şiv im ez di destê te da*
*Bade teq ez mestê te da*
*Ta ta biskê ez girêdam*
*Pir dilşad im ez nav xeman*

*Di nav xeman ez tine bim*
*Nehêle ku ez bê te bim*
*Gelekî hez ji te dikim*
*Dexîl ez bim eman eman*

*Her pêde diçim ezgorî*
*tu li rêza herî jor î*
*Ez pêpelûkên bin piyan*
*Di bin ling de wek sêliman*

*07.06.2018*



# نصوص شعرية

حسن مستي

حين عودة
أجادل نحيب المكان
بنفس النسق من اللهاث....
أمد نظري باستحياء
إلى ملامح التراب
ترمقني بدموع حمراء
شعور شاحب يخيم على جدلية الصمت
كلانا يشبه الآخر
فأنا من رحم هذا المكان..

---

مكان غير صالح للغناء
تراتيل مخنوقة في حلق ناي
ثقوب الروح لا تجيد استنشاق
ألحان رمادية
عبثا ننفخ في الحرف
في فجوة قصيدة عذراء
ارتأت الخلوة إلى حين مرحلة ...

---

حين المنال ضباب
وحين الرحيل صقيع ماكر..
ابحث عن آثار الضجيج في مخيلة المكان
اختلي مع صفيرالريح
و استرق النظرفي جوف الفراغ
علّ النجاة قشة هائمة
على سقف حلم

---

أشيائي المبعثرة
رغيف رحيلي
والفراغ الذي يعيشه حجر الرحى
مَن يلتقط حبات المطر
ويحيل السكون امرأة حبلى

تلك الصور العابرة أمام أصابعي
كسحابة جافة
أحاول ترميم ملامحها
بما تبقى من نشيج الروح..
وأعلق عليها ابتسامة
كانت قد مرت من هنا.....

---

و من جملة ما
أحاول الحفاظ
على نقاءها
إني أنّقع الكلمات
في محبرة الروح
أحمل إثم تخمرها
و أهديك كأس القداسة
من شفاه القصيدة
لتكون التوبة
آخر الاحتمالات...

---

أكره النص الصريح
دون عناء
فالقصيدة أنثى مزاجية
أفصلها على مقاس مخيلتي
أتوغل في متاهة مفاتنها
أقلبها يمينا وشمالا
حتى تستوي على عرش الجمر
وأستوي... ■

توزع مجـــــاناً

# ZIYANÊN BARANA ÎSAL



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٦١) ٢٠١٩/٤/١ م